Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (249) | Tîrmeh / 15-7-2023

# Hesekê.. Berdewamiya kirîza avê û bêdengiya civaka navdewletî



**Kurdistan-Dîlan Omer**

Zehmetiyên xelkê Hesekê, Tiltemir û gundên derdora wê berdewam e, di pirsa dabînkirina ava vexwarinê de, ku her havîn ev kirîz zêdetir dibe, û ev yek jî dibe sedema belavbûna nexweşiyan li wan deveran. Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê daxuyaniyek di vê derbarê de belav kir û ragihand" ev kirîz piştî wê yekê derket ku grûpên çekdar destê xwe danîn ser wêstgeha Elok li Serêkaniyê ku jêdera sereke ya ava Hesekê û Tiltemirê bû, herwiha kirîz zêdetir bû ji ber nebûna ti proje û alternatîvekî ji aliyê rêveberiya dîfakto ve, tevî hebûna karînên ber dest, û herdu aliyan jî hevdu tometbar dikin bi nebûna kehrebê û avê".

> **Pêwîste kirîza avê ji nakokiyên siyasî bê dûrxistin**

Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê bikaranîna vê kirîzê şermezar dike û daxwaz ji civaka navdewletî, rêxistinên mirovî û aliyên Emerîkî û Rûsî dike destêwerdanê bikin û vê pirsgirêkê çareser bikin û jiyana xelkê normal ji nakokiyan dûr bixin û piştevaniya wan bikin. Welatiyekî bajarê Hesekê derbarê kirîza berdewam ya avê wiha dibêje"Ev çend sal in kirîza avê li bajarê wan berdewam e, û heta niha ti çareserî nehatiye dîtin û pêwîste xelkê me ji vê kirîza kujer rizgar bibe". Welatiyek din jî wiha dibêje, ev karesateke mirovî ku bi serê xelkê me de hatiye û nabe civaka navdewletê beramber vê karesatê bê deng be, û ew bûne qurbaniya nakokiyên siyasî û aliyên şerker".

---

**Mihemed Ismaîl: Em dixwazin diyalog berdewam bibe, lê Mezlûm Ebdî nekarî gerentiya berdewamiyê bike** *Rûpel—2*

**Lîreya Sûrî dadkeve û nirxê kelûpelan jî berdewam zêde dibin** *Rûpel—3*

**Pirtûka nû ya Serok Barzanî derdikeve** *Rûpel—4*

# Mihemed Ismaîl: Em dixwazin diyalog berdewam bibe, lê Mezlûm Ebdî nekarî gerentiya berdewamiyê bike



**Kurdistan-Bidûvçûn**

Endamê Desteya Serokatiya Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê û Sekretêrê Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya Mihemed Ismaîl derbarê daxuyaniya Fermandarê HSDê Mezlûm Ebdî li ser dubare destpêkirina diyaloga Kurdî-Kurdî de  radigihîne,

> **Mezlûm Ebdî û PYDê xwedî li îmzeya xwe derneketin**

"Mezlûm Ebdî û PYDê xwedî li îmzeya xwe derneketin û belgenameya ku hatiye îmzekirin jî cibicî nekirin, eger ev belgename cibicî nebe, ma gelo dê çawa diyalog careke din dest pê bibe?!."

Şandeyê Emêrîkî bo Bakurê Rojhilatê Sûriyê Nicholas Grainger û şanda pê re 8ê vê mehê li bajarê Hesekê ligel şandeke ENKSê civiyabû.

Endamê Desteya Serokatiya ENKSê û Sekreterê PDK-Sê Mihemed Ismaîl ku di civînê de amade bû, ji kenala Kurdistan24 re ragihand, "Me di civînê de behsa rewşa siyasî ya deverê, tengaviya ku miletê me tê re derbas dibe, pirsgirêkên aboriyê û kêmbûna ava vexwarinê li parêzgeha Hesekê û kiryarên PYDê li hember gelê me gotûbêj kirin."

Mihemed Ismaîl destnîşan kir, Şandeyê Emerîkî û tîma avedankirin û xizmetguzariyan a ku ligel wî bû, di civînê de tekez kirin ku ew kar dikin ji bo vê qeyrana ku li ser deverê heye sivik bikin.

Her wiha got: "Me ji şandeyê Emerîkî re tekez kir ku nabe gelê me bibe qurbanê nakokiyên siyasî yên derbarê qutkirina ava westgeha elok de, ji ber ku ev pirsgirê dê bibe sedemeke din a koçberbûna xelkê deverê.

Jêdera sereke ya ava vexwarinê ya bajarê Hesekê û gundewarê wê ve, ji westgeha Elok a li Serê Kaniyê ye, grûpên çekdar ên opozîsyona Sûriyê yên Tirkiye piştevaniya wan dike jî, bi berdewamî avê li ser parêzgeha Hesekê qut dikin.

Her wiha Mihemed Ismaîl amaje bi wê yekê kir ku di beşeke din a civîna ligel Şandeyê Amerîk de, pirsa deriyê sînorî Sêmalka/Pêşabûrê hat behskirin û got ku endamên ENKS û alîgirên wê wek ku di zîndaneke neçarî de ne, ji ber ku Rêveberiya Xweser rê nade wan çûnûhatinê di wî derî re bikin.

Diyar kir jî, ev derî tenê di destê (PYD) de ye û ew jî vî derî tenê ji bo berjewendiyên xwe bikar tîne.

Li ser daxuyaniya fermandarê HSDê Mezlûm Ebdî ku berî çend rojan banga dubare destpêkirina diyaloga Kurdî – Kurdî kiribû, Mihemed Ismaîl eşkere kir, "Aliyê Emerîkî di civînê de behsa dubare destpêkirina diyaloga Kurdî – Kurdî nekir. Lê em her tim ji diyalogê re amade ne. Me di vê pirsê de gavine baş avêtibûn û me bi hev re belgenameyeke gerentiyê ji 6 xalan jî bi hev re îmze kiribû, Mezlûm Ebdî û aliyê Emerîkî li ser îmze kiribûn. Em amade ne ji cihê ku em gihîştine, dubare dest bi danûstandinan bikin."

Diyar kir jî: "Di pirsa diyaloga Kurdî de, me berê li ser nêrîna siyasî lihev kiribû û me gelek xalên din derbas kiribûn, lê mixabin aliyê PYDê xwe da aliyekî û tiştê li ser hatiye lihevkirin binpê kir. Mezlûm Ebdî û PYDê li îmzeya xwe nebûne xwedî û belgename cibicî nekirin, eger ev belgename cibicî nebe, ma gelo dê çawa diyalog careke din dest pê bibe?!."

> **Mezlûm Ebdî nekarî gerentiya berdewamiya vê diyalogê bike**

Endamê Desteya Serokatiya ENKSê tekez kir jî: "Em xemxwarê wê yekê ne ku diyalog berdewam bibe û bigihe encamine baş, lê Mezlûm Ebdî nekarî gerentiya berdewamiya vê diyalogê bike. Piştre PYD ev diyalog binpê kir û ofîsên me şewitandin û zemîna ku diyalog tê de berdewam dibû têk da, Mezlûm Ebdî jî nekarî tiştekî bike, wî nekarî destdirêjiya li ser me û şewitandina ofîsên me rawestîne."

> **«PYD zemîna ku diyalog tê de berdewam dibû têk da»**



# Lîreya Sûrî dadkeve û nirxê kelûpelan jî berdewam zêde dibin

**Kurdistan-Şerîf Xidir**

Di vê dema dawî de berdewam Lîreya Sûrî nirxê xwe beramber dolarê Emerîkî jidest dide, û ev yek jî bûye sedema buhabûna nirxê kelûpelan û madeyên xwarinê li nava bazarên Kurdistana Sûriyê, helbet ev rewş jî ji aliyê bazirganan ve tê bikar anîn. Welatiyek derbarê rewşa niha ya bazarê wiha dibêje, her tişt her kelûpel li nava bazarê bûye bi dolarê Emrîkî û bazirgan bi kêfa xwe liv û tevgerê bi bazarê dikin, helbet ev yek jî bûye bargiraniyeke mezin li ser welatiyan.



Rewşa abûriya xelkê gelekî zehmet bûye, û ew nikarin ji xwe re pêdviyên xwe yên rojane bikrin ji ber ku buha ne û zêdeyî karînên wan in. Welatiyekî din jî wiha dibêje, li bazarê çavdêrî nîne, û her bazirganek bi kêfa xwe nirxan destnîşan dike, lewma ev yek dibe bargirniyeke mezin li ser mile welatiyan, welatî jî bê çare ne û nikarin tiştekî bikin û bazirgan jî ji aliyê rêvevberiya heyî têne piştevanîkirin.

# Rêwîtî bi demê re derbas bû



**Henan Cefer**

**Stenbol**

Ez dereng vegerîm mal, piştî ku min dema xwe li qehwexaneya kuçê yê serê kolanê derbas kir, min her tişt ji heval û xelkên wir bihîst, guhdarî hinekan kir û peyvê hinan piştguh kir, yên girêdayî bi karê wan ve çi cefa û ezyat kişandine û çawa li jêdera roziya xwe digerîn û ez di nav wan de biyanî bûm, ketim nav demê li xewn û bîranînên xwe vegerîm çewa ku mişext bûm, çawa sînor birriyan, çawa bi pereyên pir xwe gihand biyanistanê û ketim dû rozî û xwandina zarokên xwe û di vî bajarî biyan re derketim û çawa min qelebalixa alavên kargehê êtir kir, lê min dixwest ku ez xwe biçespînim di jiyanê de, lê roja ku ez neçûbûm kargehê wê rojê dizîn çê bibû û navê min jî bi diziyan re li ba asayîşê hatibû nivîsandin, ji wê rojê de katwar li min da zorê û serpêhatiya min hat guhartin, min bêtir xwe pêşxist ku karibim mîna alavan bi hedan berdewam bikim û sûdê ji derdor û ramanên xwe bigirim û helwestên xwe bi zelalî xuya bikim heya wê demê ez gihîştim nêzî mal lê ramanên min velikumîn di bîraniyan de li hev civîn û li hev ketin, dema hevjîna min derî ji min re vekir zarokê di hembêzê de nexweş digirî, yekser bezî hundir ez maliq mam û bilez çûm derî vekirî hêşt, lê ez li xwe hayî bûm ku derî vekirî maye min derî kir hev û destê xwe avêt berîka xwe ku kilîdê derxim, berîk qul bibû lê ji birçîbûnê re zikê min dikir qurequr, çûm pêjxaneyê min xwerin kir sehenê û hatim pêş ekrana wêneweşê rûniştim û min li nûçeya dawiya êvarê temaşe kir çawa erdheja şeşê reşemehê xanî hilweşîne û xelk di bin kavilan de mane, ez rabûm ser piyan tebat nehat, ez di xwe de hêrs bûm û qeherîm pir tişt û bîranînên min winda bûn bi heval, dost û merivên min binkavil bûn, hîn nûçe berdewam e min li katjimêra ku li ser dîwêr sêwî daliqandî sekir, çend xulekan ketim rêwîtiya demê derbas bûm, min sal jimartin, xwest ku paş ve vegerim salên şadîmanê, lê mîlê demjimêrê bê rawestan dimeşî û ketim dema niha pê re çûm ketim hêviyên paşerojê da ku bi xwe ve girêdim, hîn ez di vê rêwîtiya xwe de me, dengekî bi hêz li kolanê hat di cih de bê ku biponijim derketim, min dît ajovan li dorhêla siwarîka xwe digere ezmûn dike û pîrejinek li erdê dirêj kiriye, ajovan li siwarîka xwe sîwar bû û çû, min guhdar kir yek bi navê min gazî min dike, li paş xwe nêrî çaygerê qehwexaneyê ye got: Ev cizdanê te ye, te li ba me li ser masê ji bîrvekiribû û ev wêne raberî min kir û got: Ev wêneya zarokatiya te ye, ez derbasî demê bûm bê ku ez spasiya wî bikim li bîranîna xwe vegerîm rojên rêveberiya xweser li Efrînê digotin: Jiyan bê serok nabe û çawa mala ciwanên şoreşger zarokên min dizîn, revandin birin û heya niha aga min jê tune ye, tenê wêne û bîranînên wî ne, ew sedema kuştina min bû, min wêne kir cizdanê xwe û ez vegerîm malê li ser rûniştekê rûniştim û destê xwe da ser rûdêmê xwe û ponijîm... dûr çûm... ketim aşopa wê demê, hevjîna min hat li pêrgî min rûnişt û xwe avêt teniştî min, bi dizîka ramûsanek ji min dizî, destê xwe kir destê min û got: Li dijwariya xwe nenihêre ev narvîna me kurdan e, ezê rabim piyaleke qehwe çê kim ku tu bêhna xwe fereh bikî, di wê kêlîkê de zengilê pêgera min lêket, min bi destê lerizî vekir hemsiyê me ye ji gund, bê silav û pirsîn got: Heyran dêbavê te baş in, lê di vê derengiya şevê de du çeteyên artêşa azad ketin mala we dêbavê te êşkence kirin, dest û devê wan girêdan, rinde ku ew nekuştin, her tişt dizîn û pere jî birin niha ewna baş in, ez herbilîm û zimanê min kilîd bû, min nikarî bi dê û bavê xwe re bipeyvama û dilê wan xweş bikira, hevjîna min telefûn ji dest min girt û dilê wan xweş kir, baraneke xemgîniyê bi ser min de barî û min sed nalet li biyaniyê hanî, ez û bêdengiyê ve gengeşe bûn heya helatina royê û bi wîçewîça balindeyan re şiyar bûm û bi dêbavê xwe re peyvîm heya em bûn sîwarê hêvîyên roja nû.

# Navenda Barzanî ya Çand û Geşepêdanê li Efrînê hate vekirin







**Kurdistan-Efrîn**

Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî di zincîreya çalakiyên xwe yên mirovî de, Navenda Barzanî ya Çand û Geşepêdanê li bajarê Efrînê vekir. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî 4ê Tîrmeha 2023an bi amadebûna hejmarek mezin ji rewşenbîr û kesayetiyên civakî yên bajarê, Navenda Barzanî ya Çand û Geşepêdanê li bajarê Efrînê vekir. Li vê navendê di qonaxa yekem de dê çalakiyên cuda ji bo zarok û xwendekaran bên kirin, wek fêrkirina zimanan, xulên fêrkirina mûzîk û hunera xêzkirinê. Piştî erdheja 6ê Sibata 2023an ku ziyaneke mezin gihande herêma Efrînê, Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî roja 10ê Sibata 2023an, wek yekem dezgeh alîkariyên mirovî gihandin Efrînê û gundên wê û ji wê demê ve bi belavkirina alîkariyan berdewam e.

# Pirtûka nû ya Serok Barzanî derdikeve

**Bidûvçûn**



Baregeha Barzanî ragihand, di demeke nêz de pirtûka nû ya Serok Mesûd Barzanî dê bigihe ber destê xwendevanan. Di daxuyaniyê de Baregeha Barzanî eşkere kir, çapa yekem a pirtûka nû ya Serok Barzanî, berga şeşem a "Tevgera Rizgarîxwaz a Kurd" li jêr navnîşana "Kurdistan û Iraqa Nû, 2003-2016" bi zimanê Kurdî dikeve ber destê xwendevanan.
Herwiha hat diyarkirin, pirtûka nû ya Serok Barzanî ji 1234 rûpel û du bergan pêk tê û behsa qonaxeke herî girîng a dîroka nû ya Kurdistanê û pêşhateyên wê yên dîrokeke sêzdeh salî dike û ji çardeh beşên cuda pêk tê.
Li ser naveroka pirtûkê, Baregeha Barzanî eşkere kiriye, pirtûka Serok Barzanî balê dikşîne ser rewşa Kurdistan û Iraqê û bi hûrgilî behsa rêzebûyeran dike, ku jiyana siyasî ya Herêma Kurdistanê û Iraqê biriye qonaxeke nû.
Serok Barzanî di pirtûkê de bi hûrgilî behsa proseya siyasî ya Herêma Kurdistanê û damezrandina Serokatiya Herêmê û pêwendiyên Herêma Kurdistanê û welatan û hilbijartinan û bûyerên din ên girîng ên wan salan dike, herwiha behsa şerê DAIŞê û qehremaniya Pêşmerge û berevaniya gelê Kurdistanê li hember êrîşên terorîstên DAIŞê heta operasyona azadkirina Mûsilê dike.

# Cih



Ebdulsemed Mehmûd

Ew cihê her roj
Ez lê radwestiyam
Min ciwaniya welatê
xwe
Lê didît!?
Ewrekî reş raserî wê
hat
Ji rokê re digot:
Hin ariyê bi çavên xwe
dake
Xwîna min
Hin tîp jibîr kirin
Yên din jî bi nexweşiya
bê ketin
Jiyan min têşîne
Zêde wisa dûrnaçim
Rê jî winda dibin
Li ber stûnên
bîranînan
Li qiraxa tomet û
loman
Ev e sedsal; li hêviya
Riya xweş im
Sozên ji mirinê
veqetandî
Li ser xaka nimêjan
Ber bi evînê ve
dimeşim
Ronak min ber
Bi azadiyê ve tajo
Şevên serxweş
Di destên min de kom
dibin
Bi roj;
Li asîmanê cîhanê
Firiyam
Bi şev;
li asîmanê cîhanê
Firiyam
Bajar bi bajar
Gund bi gund
Tenê asîmanê Qamişlo
Min dirêse
Bi roj,
Bi şev,
Min li dengê
Nîl û Amazon û
Yangistî
guhdar dikir
Xwimîna Dicle û Ferat
Bîna min vedikin
Bi roj,
Bi şev,
Li serê Êvrêst û Kî û
Kanşîconga
Min çixare vexwarin
Çêj nagihên ya
Çixareyên li ser dika
Xirbexezal
Bi roj,
bi şev,
Min hemî Solavên
Cîhanê dîtin
Ancêl û Niyagra
Tenê Elî-Beg û Bêxal
Aniya min hênik kirin
Bi Roj,
Bi Şev,
Min hemî ba kişandin
Hemî av vexwarin
Bayê wan min têr nake
Ava wan tîna min
naşikîne.